Yadeya 49 Saliya Vejîna Kurd

Dr. Rozad Elî

Li 14 Hezêranê, yadeya 49 an ya damezrandina "Partî Demoqratî Kurd li Sûryê" derbas bû. Yadeya damezrandina yekemîn rêxistina siyasî ya Kurd li Sûriyê, yadeke pir watedar e, li ba Kurdan cihê qedir û serbilindiyê ye û li ba dijminên gelê me jî cihê nerazîbûn û diltengiyê ye. Ji ber wê jî bûye boneyeke zor watedar, hemî partî û rêxistinên me, bîranîna wê pîroz dikin.

Siyaseta dewletê di salên pênciyan de?

Di navbera deh salan de, ji serbixwebûna dewleta Sûriyê, kes û partiyên şofenîst û nijadperest ên Erebî, kanîbûn bi hêz derbas nav laşê dewletê bibûna û saziyên wê di bin îrada xwe kirana. Ji wê hîngê ve, wan siyaset û pêlanên nijadperest li dijî hebûna gelê Kurd li Sûriyê gerandin, înkar û tunekirina miletên din li Sûriyê mîna bingeh ji siyaseta xwe re dibirin. Nedixwastin rastiya hebûna gelê Kurd li Sûriyê bibînin. Digotin Kurd li Sûriyê tunene, yên hene jî, çendek in, penaber in, ji Tirkiyê hatine û axa Ereban zep kirine, yanê ew ne ji vir in, xaka wan li vir tune ye, mêvan in, bi warê xwe ve negirêdayî ne. Ji lewre jî, gereke her kesê ku, di nav sînorên Sûriyê de dijîn Erebkirinê bipejrînin..

Li ber roniya wê ramana nijadperest, wan mafên gelê me yê Krud li Sûriyê rewa nedidîtin, lê mikûr nedihatin, û ji wê hîngê ve û ta roja îro, bi her awakî pêkol dikin da ew ramana şofen bikin sazî û siyasetên dewletê re siyasetke fermî ji hemî.

Rewşa gel û civata Kurd çi bû?

Li wê demê, berî pêncî salî, piraniya xelkê Kurd, gundî, nexwende , çav girtî bûn, xwe nedinasîn, nizanîn Kurd û Kurdayetî çî ye û çawa gereke kesayetiya xwe biparêzin. Ew bibûn wekî ku bi qeder û qismetê xwe razî bibûn, li ber lehiya şofenîstê dest û pê ji ber xwe berda bûn û pêde diçûn, parastina hebûna xwe û bicihanîna mafên xwe yên netewî ne li bîra wan bû. Dewlemend û axayên Kurd jî, wek adetê, tenê berjewendiyên xwe diparastin û xwe bi dezgeha dewletê ve girêdidan. Û gava ku Kurdekî hewldida doza Kurdayetiya xwe bike, toşî zordariyê dibû û bê erê-na davêtin binê zîndanan.

Pêwistî bi rêxistineke siyasî

Di nav van rewşên paşketî û xirab de, tenê du rê li pêş zanayên Kurd hebûn:

Yan siyaseta şofenîstan bipejrînin û her tiştê ku navê xwe Kurd, were jibîrkirin û li dwaiyê bêjin em Ereb in, ev jî tiştekî pir zor bû, ustubariyeke dîrokî bû û bi biryaran netê meydanê.

Yanê jî, gerek bû ku, bi ustubariya xwe ya dîrokî rabin, erkên xwe yên netewî û Kurdayetiyê nas bikin. Pêwîst bû bi gelê xwe bidina zanîn, ku Kurd jî miletek e, mafê wî jî di hebûn û mayînê de heye, ew jî xwedî ziman, çand, kultûr, xak û dîrok e û ji miletên cîhanê yên ⟶